Civaka Xwendevanên Êzidiyan (ÊSG) li bin Mikroskopa Qendîl de:

"Egerên Sistbûna Xebata Wan -Derd û Astengî-"

Weimar, Nîsan 2001, Li dawiya sala 1998an komeke xwendevan û ciwanên Êzidî li Elmaniya saziyek bi navê (Civaka Xwendevanên Êzidiyan) "ÊSG" damezrandin. Di demeke kin de ÊSG deng veda, lê mixabin, weke çend komelên Êzidiyan din yên sist bû. Em behwerin, sistbûn û ne pêjde çûna vê saziyê bi gelek egeran ve girêdayi bû. Yek ji wan; civaka ciwana ya pasîv û kêm zanebûniya di nav wan de. Herwisa rewşa civaka pir bêtifaq û perçebûyi. Bê guman egera din di vî warî de; komelên Êzidiyan tawanbarin, ji ber wan piştgirtiya vê koma ciwanan nekir û hindeka di xwest wan bixe bin çengê xwe, lê gava ÊSG serbixwe karkirin astengî derxistin û dev jêqeriyan. Civaka me jî bi xwe armanca berpirsiyarên ÊSG ê fêm nekir, û ne xwest xwe nêzîkî wan bike; belkî ji ber peyva „Rîform" ku ÊSG bi kartanî. Belê kesî serê xwe ne êşand bizanibe, ev çi „rîforme" ew di xwazin. Êriş jî hatin ser wan. Li dawiyê de derdekî mezin û sarbûnek di xebata vê komelê de derket. Em jî wek rojnamek bi giranî li ser pirsên ciwanan di sekinin, di hizretekê de bûn, rewşa avabûn û bêçarbûna vê saziyê nasbikin. Lewra jî hevalê me **Fewzî Çolî** rûniştinek li gel serokê ÊSG ê çêkir û em bêtir nêzîkî boçûn, dîtin, derd û astengiyên vê saziyê kirin.

<u>Ibrahîm Kus dibêje</u>:
„Em Ketin Tora Civakê“

Bielefeld, Nîsan 2001, Çend xwendevan li roja 13.12.1998 kongira yekê ya Civaka Xwendevanên Êzidiyan ÊSG li darxistin. Paşî wê bi dmeke nêzîk gelek tişt derketin meydanê û karê vê saziyê sekinî. Û ji ber ku heta neha tariyek li ser ÊSG hebû, **Qendîl** li hêja Ibrahîm Kus, serokê ÊSG bû mêvan, ji bo ronahiyekê bide ser babetî.

Gava me pirsiyar kir; „Çima ÊSG çêbû?“ weha bersiva me da: „Bi rastî pêwiste em vê bînin ziman, em ne li dijî rêxistinên Êzidiya ne, em wan destek dikin, tucarî xwe mîna elternatîv ji wan re nabînin, lê belê li gor behwerîyên me valahiyek li holê hebû, ew jî girêdayî rewşa xwêndikaran bû, ji ber taybetiyên wan hene. Komelan karê xwe bi giranî dida ser giştiya çivakê, ji ber vê sedemê û ji bo parastina mafê xwêndikaran û perwerde kirina ciwanan, her weha peydabûna derfetan ji xwêndikarên Êzidiyan re, me pêwistî bi ÊSG hebû. Ez di xwazim bêjim ku Yekêtiya Êzidiyên Kurdistan (YÊK) di vî karî de xwedî insiyatîv bû û di civînên destpêkê de amade dibû.“ Herwisa hêja Kus li ser alikariya YÊK û keda wan di damezrandina ÊSG de weha di nerxand: „Wan di xwestin rêxistinek bi navê xwendevanan damezirînin, lê belê hevalên me xwestin bi xwe, bi derfetên xwe, û ji bo xwe karbikin, bi gotinek din dixwestin di karê xwe de serbixwe û azad bin. Ji wê demê û pêva “ÊSG” bi xwe, bi keda çend hevalan yên ku ne girêdayê tu rêxistinan bûn li ser piyan sekinî. Ez dûbara dikim ku karê “YÊK” ji bo “ÊSG” tenê di demê destbêkê de insiyatîv bû.“

Qendîl: Çi proje li pêşiya we hebûn û taybetiyên danûstandinên we çibûn?

-„Bê goman di destpêkê de em li ser rewşa civaka Êzidî bi giştî di axifîn, me li ser pêşeroja Êzidiyan li Elmaniya nerînên hevalan digirtin, dan û standin çêdibûn, helbet teybetiyek civînên me hebû, çimkî me dixwest xebatê bikin; çawa emê karibin têkiliyan bi rêxistinên biyanî yên Elman û yên din re çêbikin û çawa van têkiliyan bikin xizmeta xwendevanên Êzidî. Lê mixabin di nav mede tu hevalên bi profîsiyonal li ser rewşa Êzidiyan ya olî karbikin tune bûn û tu olnas jî tune bûn ji ber vê yekê me civînên xwe li ser rewşa xwendevanan û avakirina têkiliyan darbas di kirin.

> *„Rîforim: Ne ser û binkirina dînê Êzidî ye”*

Qendîl: Di nava “ÊSG” de hinek caran tiştên balkêş dihatin gotin, mîna “guherîn” yan jî “Rîforim” ev ji were bi çi wateyê dihat?

-„Belê raste me li ser vî babetî hinek caran axiftin çêkir, hevalên me nerîn û behweriyên xwe diyarkirin, lê belê ez dixwazim bi bêjim ku rîforim ji bo me ne ser û binkirina ola Êzidiyan bû, yan jî hilanîna sed û hedên ola me bû. Na! ne ev tişt bû, kes nikare van tiştan bike. Rîforim ji bo me dihat wateya bandora têkiliyên di navbera civaka me û ya Elmanî de, mebest ew bû ku em bi karibin ola xwe ji esimilasiyonê bi parêzin. Dema zarokên me diçin dibistanê li gor civaka Elman perwerdê dibin, lê li mal li gor kultûra xwe perwerde di bin, me dixwest vê harmoniyê di navbera herdû kultûran de pêk bînin. Gelekan em rexne kirin û hinan jî êrîs dan ser me, ji ber ew nerîn û behweriyên me di derbarê rîforman de tê negihiştin. Ez behwerim ku Êzidî di karin rîformên çivakî çêbikin, civaka me civakek komplêkse, girtiye û perçebûye, di jiyana her civakê de hêlên nêgatîv û posetîv hene, eger em bixwazin, an nexwazin rîforim wê çêbibin. Ez mîna gelê me hertiştî problêm nabînim di civaka Êzidiyan de hertişt problême, ji min re rîforim riyalîtek normale. Em sistemek biçûkin ji seroksistema mezina Elman, dema em bêjîn emê bê seroksistem, bi xwe li der-vayî civaka Elman bi mînin, ev ne raste, dûvşopên vê behweriyê wê pir di demên pêşda zorê bikşînin.“

Qendîl: Projeyên ÊSG ji bo dema pêş hene ?

-„Ez vê gavê nikarim li ser pêşeroja ÊSG bi axifim daxwazên min hene ku ÊSG karê xwe bi domîne û giraniya xwe bide ser rewşa xwendevana û perwerde kirina ciwanê Êzidî da bi karibin li zanîngehên bilind bixwînin. Civak bi projan pêş dikeve, mixabin tu projeyên me li ber çav nînin.“

Belê xwendevanê hêja hîviya mejî wek Qendîl ewe; ev komele careke din vegere jiyanê û xizmeta civaka xwe bi rast û dilgermî bike.

Rîportaj: **Fewzî Çolî**